

Vaksîna vîrusa koronayê

– Nuvaxovid (Novavax)

Vîrusa korona ya nû rêya nefesê diwerimîne. Gelek kesan nîşanên wan tune ne an jî nîşanên sivik tecrûbe dikin, lê dibe ku hin kes bi giranî nexweş bibin. Kesên kal û pîr, û yên ku berê xwedan nexweşiyek din a taybetî ne, di xetera nexweşiyek giran an xetera mirinê de ne. Vaksîne mirovan ji girtina nexweşiya girana Kovîd-19 diparêze.

Kî dibe vaksîna vîrusa koronayê lêbide?

Vaksînen vîrusa korona ên ku ji aliyê Bernameya Parastina Neteweyî ve têne radest kirin ji kesên li Norwêcê dijîn re radest dibin. Vaksînekirin belaş û bi dilxwaziye.

Ji bo agahdariyên li ser vê yekê ka ev vaksîne ji kî re tê radestkirin, çawaniya birêxistina vaksînê, û dema lêdayina vê, serdana malpera bajarê xwe bikin.

Vaksîn çawa tê lêdayîn?

Vaksîn li sermilî tê lêdayin. Berî vaksînekirinê, dê ji we were pirsîn ka hûn baş in û gelo laşê we li hember vaksînen din ên ku we berê wergirtine bertekek nîşan daye yan na. Eger hûn tûşî Kovîd-19 bûne an jî berê li dijî vîrusa korona vaksîne bûne, ducanî ne, alerjiya we heye, derman dixwin an jî pirsgirêkên we yên tenduristiyê yên din hene, ji kerema xwe me agdar bikin. Şîretên ser hejmara dozan û navberên demiyê koma xwe bişopînin. Navenda vaksînekirinê dikare di vê yekê de alîkariya we bike. Pêdivî ye ku doz di dema diyarkirî de bêne lêdayin. Bi piranî eger nexweşiyê te ya çalاک û taya ser 38°C hebe, bi giştî vaksîne tê paşxistin. Piştî vaksînekirinê, ji we tê xwestin ku herî kêmtên 20 deqan li cihê vaksînekirinê bisekinin.

Ev vaksîn çawa dixebite?

Ev vaksîn vaksîneke ser bingeha proteîne ye ku li ser bingeha teknolojiya vaksînê ya kevneşopî ava bûye. Di vaksînê de cureyek spike yên hevparê vîrusa korona (proteîna spike) heye ku pergala berevaniya laşî dikare li ser perwerde bike. Wekî din, di vê vaksînê de maddeyek nû (adjuvant) heye ku dibe alîkar ku berteka berevaniya laşî zêde bike. Bi vî awayî, sîstema berevaniya laşî hînî naskirina spike yê vîrusa koronayê dibe û dê alîkariya laşî bike ku xwe li hember vîrusê biparêze. Di vê vaksînê de vîrusa zindî tune û nabe sedema nexweşiya Kovîd-19. Vaksîna vîrusa korona pêşî li nexweşiyê digire. Ev vaksîn nikare nexweşiya heyî derman bike.

Ev vaksîn çiqas bibandor e?

Vaksîn bi tevahî li hember belavbûna zêde ya nexweşiyê din, kesî neparêzin. Ji ber vê yekê, divê hûm pêşniyarên kontrolkirina nexweşiyê yên heyî jî bişopînin.

Bandorên neyînî

Piraniya bandorên neyînî di çend rojên pêşîn ên piştî vaksînekirinê de xuya dibin. Nîşan bi giştî sivik û nerm in û piştî çend rojan diçin, lê hin kesan nîşanên girantir hene. Bi giştî kesên ciwan bandorên neyînî ji kesên pîr girantir tecrûbe dikin. Bandorên herî giştî pêk tên ji êşa li cihê vaksînekirinê, westandin, êşa masûlk û movikan, serêş, nerehetî, gêjbûn û vereşin in. Hin kes, bi giştî piştî doza duyemîn tayê digirin. Bi giştî, bandorên neyînî piştî vaksîna doza duyemîn ji doza yekem re zêdetir in. Li gorî lêkolînên ser vaksînê, wusa xuya dike ku Nuvaxovid li hember vaksîne kirina bi vaksînên mRNA bandorên neyînî yê siviktir ên bi demên kurttir hene. Em nikarin derketina bandorên neyînî yê kêman bandorên ku tenê demek dirêj piştî vaksînekirine yê xuya dibin negengaz bizanin.

Eger bandorên neyînî hebin divê ez çi bikim?

Eger nîşanên we yê nediyar, giran, an demdirêj hebin, ji bo nirxandin û şewirmendiyê bi doktorek xwe an pisporek lînerîna tenduristiyê re têkilî daynin. Bêyî ku hûn bifikirin ku ev nîşan ji ber vaksînê ne an na, bi wan re têkilî daynin. Karmendên lînerîna tenduristiyê berpirsyari in ku her bertekên giran an neçaverêkirî yê ku guman dikin ji ber vaksînê be, ragihînin. Her weha hûn dikarin bi rêya [helsenorge.no](https://www.helsenorge.no) agahdariyek bişînin.

Min çi vaksîn wergirtiye?

Dema ku vaksîna vîrusa korona li we hate lêdayin, ew tê li Nivsîngeha Koçê ya Norwêcê (SYSVAK) were qeyd kirin. Hûn dikarin li ser [helsenorge.no](https://www.helsenorge.no) bigihîjin agahiyên xwe

Gelo hûn dixwazin zêdetir bizanin?

Ji kerema xwe ji doktorek xwe an pisporek tenduristiyê din bipirsin an serdana malpera Enstîtuya Tenduristiya Giştî ya Norwêcê li ser www.fhi.no/cvp bikin